Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :834 31-Çile- 2021 Rojnameya Siyasî , Civakî û Çandî

# Armanc; Çareseriya Demokratîk E

## Cara yekê li Hesekê petat tê çandin



Li kantona Hesekê cara yekê ye ku kartol (petat) tê çandin. Çavdêrên projeyê serkeftina projeyê piştrast kirin û plan dikin ku di mewsimê bê de dê rûbera projeyê berfireh bikin.

Sîstemên ku Sûriyê hikum dikirin bi taybet rejîma Baas, bi zanabûn Sûriyê di aliyê çandiniyê de dabeşî gelek herêman kiribûn. Her çi qas xaka bakurê Sûriyê dewlemend e jî, gelek cureyên darên berhemdar û sebze bi zanabûn tê de nehatin çandin.
Hikumeta Şamê ji destpêka avakirina xwe ve, şêniyên herêmên bakur bi taybet herêma Cizîrê neçar kirin ku tenê genim û ceh biçînin û çandina zebzeyên havînê û zivistanê qedexe kir da ku van madeyan ji hundirê Sûriyê bînin.
Tevî siyaseta ku ji wê demê ve li dijî cotkaran hate meşandin, lê gelek cotkar parastina zeviyên xwe kir û ji ber tirsa girtinê ji hêla hêzên hikumeta Şamê ve, gelek cureyên çandiniyê bi rûberên biçûk çandin.
Piştî Rêveberiya Xweser li bakurê û rojhilatê Sûriyê hate ragihandin, girîngî da qada çandiniyê û piştgiriya cotkaran kir, da ku cureyên nû li herêmê biçin mîna darên hinaran, tirî, tû, bahîv û zeytûnê.
Têkildarî mijarê Komîteya Aborî ya Kantona Hesekê, cara yekê petat çand. Li gorî îdiayên saziyên hikumeta Şamê, dihat bawerkirin ku hilberîna petat li herêmê bisernakeve.
Li gorî çavdêrê projeyê Sadiq Eldemir, ev cara duda ye ku petat li herêmê tê çandin. Hilberîn di mewsima havînê û payîzê de hat çandin û ji bo wê 180 hiktar hate veqetandin.
Sadiq Eldemir destnîşan kir ku armanca wan ji vê projeyê ew e ku sûd ji zeviyên herêmê bigirin û cureyên nû ku berê dihate qedexekirin, derbasî nava bazaran bikin.
Ev însiyatîfa ku li Hesekê hatiye pêkanîn dê piştgiriyê bide aboriya herêmî û rêgeza xwetêrkirinê pêk bîne. Di heman demê de jî hêviyê dide şêniyên bakur û rojhilatê Sûriyê ku dikarin gelek cureyên sebze û fêkiyan biçînin, ji ber ku axa bakur û rojhilatê Sûriyê dewlemend e.
Eldemir da zanîn ku vê projeyê rewşa jiyanî ya gelek malbatan baş kir û niha zêdetirî 300 karker di nava zeviyên petat de dixebite.
Sadiq Eldemir eşkere kir ku hilberîna çandina petat gihaşt zêdetirî 600 tonan û hilberîna çandina cara duduyan gihaşt derdora 500 tonan.
Di dawiyê de Sadiq Eldemir anî ziman ku di mewsima bê de ew ê rûbera projeya xwe berfirehtir bikin, da ku li herêmên din werin çadinin, gelek malbatên din sûdê jê bigirin û pêwîstiya bazaran jî dabîn bike.
***ANHA***



**Idrîs Henan**

**Kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk bi hişmendiya avakirina çareseriyeke demokratîk li Sûriyê, Îraq, Misir û Ewrûpa têye weşandin.**



Kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk bi boneya derketina jimara 50'î li Şehbayê semînerk li dar xist. Armanca semînerê pêşxistin û nirxandina naveroka kovarê ye.

### Kovara Bi Hişmendiya Çareseriya Demokratîk Tê Weşandin

Cemîl Reşîd ku endamê radeksyona kovarê ye ji rojnameya me re axivî û ev tişt anî ziman: ”kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk kovareke peryodîk her çar mehan carekê tê weşandin. Her nivîskarek dikare têde binivîse. Hemû nivîs jî ji aliyê desteya weşanê ve kovarê tên nirxandin” .
Cemîl Reşîd diyar kir ku; kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk hemû çareseriyên guncaw di bin sîwana Netewa Demokratîk de digire dest. Ji ber ku kovar xîtabî gelên Ereb dike, ji lew re jî tenê bi zimanê erebî tê weşandin. Reşîd destnîşan kir ku her tişta girêdayî raman, çand, civak, jin û olê be, li gorî senteza Netewa Demokratîk têde tê belavkirin. Reşîd wiha dewam kir: “hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn, li gorî paradîgmaya Netewa Demokrtîk û cudabûna cografyayê di kovarê de tên nirxandin. Her nivîskarek li gorî taybetmendiya herêma xwe, di vê çarçoveyê de çareseriyan pêşniyar dike û nerîna xwe bi rêya kovara me bi raya giştî re parve dike”.
Reşîd işaret bi nasnameya nivîskarên kovarê kir û ev tişt got: “nivîskarên me ji her welatekî hene. Ji Sûdan, Cezayir, Filistîn, Urdun, Libnan, Îraq, Sûriyê û Marroko bigire heya yên ku li Ewrûpa jiyan dikin hene. Hemû jî akadîmisyen in û bi awayekî bi rêk û pêk ji kovarê re dinivîsin”.





### Fikrên Zihneyetperest Qebûl Nakin

Endamê radeksyona kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk Mustefa Şêx Mislim jî da naskirin ku kovar bi awayekî fermî di sala 2002'an meha Sibatê li Beyrûtê derketiye. Lê piştî du jimaran û ji ber hinek pirsgirêkên ewlekariyê û baş têhegihaştina siyaseta weşanê, cihê çapê tê guhertin û herdu jimar tên îbtalkirin. Di sala 2005'an de ji nû ve û bi hişmendiya çareseriya Netewa Demokratîk jimara wê ya yekê li Îraqê derdikev. Lê piştî mudexelya dewleta Tirk destûrnameya weşanxaneya wê ya li Begdayê tê kişandin û kovar berê xwe dide Silêmaniyê”.
Mustefa Şêx Mislim tekez dike ku armanca kovarê belavkirina fikra demokratîk di nava gelan de ye. Mislim pîvanên nivîsan jî wiha tîne ziman: “nivîsên xwedî hişmendiya netewperest, olperest û xwedî kapasîteyek radîkal a girtî bin, di kovara me de nayên weşandin. Hemû madeyên jimarê li gorî siyaseta wê ya weşanê tên hilbijartin û pêşniyarkirin. Êdî her nivîskarek serbest e ka sernavên çawa û çareseriyek çawa hildibijêre. Lê ya girîng ew e ku kovara me terfê çareseriya demokratîk e”.
Hêjayî gotinê ye cara yekê ye kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk li Şehbayê semînerk danesînê li dar dixe. Ji bo belavkirina wê jî, endamê radeksyonê tekez kirin ku wê hewl bidin kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk bi awayekî bi rêk û pêk bigihîne Şehbayê.

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| **Aram** | Asûde, amin, emîn, rehet, hêmin: Gundê me aram e, ti nexweşî û teşqele tê de nînin. |
| **Asîmîlason** (Fransî) | Bi darê zorê helandina civekekê ji aliyê nasname, çand û ziman ve: Ji ber zordariya dagîrkeran bi milyonan Kurd asîmîle bûne. |
| **Berpirs** (Fransî) | Kesê ji ber karê kirî, yan erkê girtî ser xwe neçarê hesabdayînê ye. Mesûl: Berpirsê saziyê alîkarî belav kir. |
| **Kampanya** (Îtalî) | 1. Di qada siyasî, aborî, çand û hwd. de pêvajoya çalakiyan: Ji bo paqijkirina kolanan şaredariyê dest bi kampanyayê kir. 2. Ji bo firotinê, erzankirina mal. Bazirganan dest bi kampanya erzaniyê kiriye. |
| **Kompanya** (Îtalî) | Şirîatî û hevpariya di bazirganiyê de. Bi giranî ji bo biyaniyan. Şirket, şerîke: Kompanya Emerîka petrolê dertîne. |
| **Operasyon** (Fransî) | 1.Rêzeçalakî. 2. Ji bo girtina sûcdaran rêzeçalakî. 3. Emelî. |
| **Pêşangeh** | Ji bo ger, dîtin û naskirinê, raxistin û bicîkirina berhemên huner. Her sal meha Nîsanê pêşangeha pirtûkan vedibe. |
| **Pêşbazî/pêşbirk** | Di zanebûn, behre, bedewî û hwd. de, karê ji bo nîşandana serkeftinê: Pêşbirka bazdanê dest pê kir. |
| **Vegotin** | Gotina berfireh. Îzah. Sedema çalakiya xwe bi berfirehî ji me re vegot. |
| **Venêrîn** | Kontrol, fehs: Li ser bendê endamên asayişê li her kesî venêrîn. Doktor li nexeweşan venêrî. |



## Şehîdên berxwedana Kobanê hatin bibîranîn

***Şêniyên Kobanê*** şehîdên meha Çile û şehîdên berxwedana Kobanê li ser gorên wan bi bîr anîn. ***R-2***

## Çekdarên PDK`ê rojnamevan Qehreman Şukrî binçav kir



Hêzên çekdar ên PDK'ê bi ser mala rojnameger Qareman Şukrî Zeynedîn de girtin û ew kirin binçavan. ***R-2***

Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 834 31-Çile- 2021 Rojnameya Siyasî , Civakî û Çandî

## Hunermend bi hunera xwe bersiva êrişan didin



Di pêşketina her civakê de bandora hunermendan tê dîtin. Hunermend bi hunera xwe jî dikarin bandora êrişên dagîrkeran bişkînin. Li bakur û rojhilatê Sûriyê tevî zehmetiyan, hunermend bi hunera xwe bersivê didin dagîrkeran. ***R-7***

# “Li hember gefan yekîtiya xwe ava bikin”

Seroka Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriyê Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed bal kişand ser serdana wezîrê Parastina Derve Hulusî Akar ji Bexdayê û Başûrê Kurdistanê û got: “Ev serdan dikeve çarçoveya siyaseta dewleta tirkî ya berferhkirinê li herêmê. Dewleta tirkî hewl dide ku kontrola xwe li başûrê Kurdistanê zêde bike, nakokî û fitneyan di navbera kurdan de çêke.” ***R-4***




## Çalakiyên greva birçîbûnê li gelek deveran bi biryardariyeke xurt didome



Çalakiyên greva birçîbûnê ên ji bo şikandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û têkbirina zordariya li zîndanan ku hatibûn destpêkirin, li gelek devaran bi biryardariyeke xurt berdewam dikin. ***R-5***

## Hûn nikarin warê Mam Zekî dagîr bikin



74 fermanan têra dagîrker û xwefiroşan nekir. Şingala sala 2014an radestî DAIŞê kirîn, vê carê bi gefên dagîrkirinê re rûbirû dimîne. Peymana di navbera Iraq, Tirkiye û PDKê de dewam heman fermanê ye. Nexwe çima Şingal careke din bibe hedefa wan? ***R-4***

## Rojava bingehê kar û aboriyê datîne




Desteya Aborî ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, bi pêşengiya şerîkeya El Hesen, 26ê Çile li gundê Melesibatê yê bajarê Qamişlo, bi nave “Golden Rose” kargeheke zeytê vekir. ***R-6***

# Şehîdên berxwedana Kobanê hatin bibîranîn

## Şêniyên Kobanê şehîdên meha Çileyê û şehîdên berxwedana Kobanê li ser gorên wan bi bîr anîn.



Bi wesîleya salvegera 6'an a rizgarkirina Kobanê ji çeteyên DAIŞ'ê, şêniyên kantona Kobanê û Meclisa Malbatên Şehîdan serdana goristana Şehîd Dîcle kirin û mûm li ser gorên şehîdan pêxistin.
Piştre endamê Meclisa Rêveber a PYD'ê Ehmed Şêxo got: "Meha Çileyê berxwedana ku tevahî cîhan matmayî kir tîne bîra me. Mîna vê rojê berxwedan gihişt serkeftinê, armancên xwe bi cih anîn û li hemberî terorê bi ser ket."
Şêxo her wiha got: "Şehîdan hiştin ku navê Kobanê ya berxwedêr li tevahî cîhanê were qalkirin."
Bîranîn bi diruşmeyên şehîd namirin û bijî berxwedana Kobanê bi dawî bû.

## Çekdarên PDK`ê rojnamevan Qehreman Şukrî binçav kir



Hêzên çekdar ên PDK'ê bi ser mala rojnameger Qareman Şukrî Zeynedîn de girtin û ew kirin binçavan.

Li gorî agahiyên hatine standin, hêzek çekdar li Komelgeha Sîrê ya Dihokê bi ser mala rojnameger Qareman Şukrî de girtin. Hate zanîn çekdarên PDK'ê kelûpelên di nava malê de tevlîhev kirine û li hemberî malbata rojnameger axaftinên nebaş jî kirine. Çekdaran rojnameger Qareman Şukrî binçav kirine û ber bi cihekî nediyar ve birine.
Birayê Qareman, Zêrevan Şukrî ji Rojnewsê re axivî û got: "Îro danê sibehê hêzeke ku rûyê xwe girê dabûn, bi ser mala me de girtin û Qareman bi xwe re birin. Destpêkê 5 wesayît hatin û rêya kolanê girtin. Dema ku çekdaran bi ser mala me de girtin, bêrêzî li hemberî dayîka min kir."
Zêrevan di berdewama axaftina xwe de got: "Hêza çekdar bi ser dukana Qareman de jî girtine û hemû kel û pelên di hundirê dikanê de bi xwe re birine."

## Partiya Sûriya Paşerojê nivîsgeha xwe li Til Hemîsê vekir

Yekîneyên Antî Teror yên girêdayî QSD`ê berpirsê kiryarên kuştinê yên çeteyên DAIŞ`ê, girt.

Ajansa nûçeyan ANHA wêne û dîmenên operasyona ji aliyê Yekîneyên Antî Terorê (YAT) ve li gundewarê bajarê Hesekê hatî destpêkirin, bi dest xistin.
Di operasyonê de serçeteyekî DAIŞ`ê A.C (40) hat girtin.
Hêzên YAT`ê di operasyonê de çekeke kalaşnikov, telefonên destan, herwiha memory card û filaş ku wêneyên serçeteyên DAIŞ`î tê de hebûn û belgeyên têkiliya wî bi wan re, girtin.




Endamê hêzên YAT`ê Tolhildan Rojava li ser mijarê ev agahî dan: "Serçeteyê DAIŞ`î A.C erkê wî ku kuştinan li herêmê pêk bîne, fermandarên QSD`ê bikin hedef û mayînan li ser riyên giştî li herêmê, daynin."

## Çalakiya 'Em hemû Asayîş in' 62 roj in didome

Çalakiya Şengaliyan ya ji bo destekdayîna Asayîşa Êzidxanê di roja 62'an de dewam dike.



Welatiyên Şengalê di çarçoveya redkirina peymana Bexda û Hewlêrê ya li ser Şengalê de, bi armaca piştgirîdayîna Asayişa Êzidxanê li pêşiya Navenda Asayişa Şengalê kon vedane.
Çalakiya ku bi dirûşma "Em hemû Asayiş in" hatiye destpêkirin di roja 62'an de ji aliyê meclis û saziyên Şengalê ve dewam dike. Çalakvan diyar dikin heta daxwazên wan pêk neyên, ewê dev ji çalakiyên xwe bernedin.
Xelkê Şengalê kom bi kom serdana konê berxwedanê dikin û piştgiriya xwe ji bo çalakiyê nîşan didin.

## Konferansa sisiyan ya jinên ciwan destpê kir



Li Silêmaniyê 3. Konferansa Jinên Ciwanên Têkoşer bi dirûşmeya, 'Birêxistinbûna jinên ciwan azadiyê bi dest tînin' destpê kir. Konferansa pêşkêşî ruhê Şehîd Viyan Soran hate kirin.
Li Silêmaniyê 3. Konferansa Jinên Ciwanên Têkoşer bi dirûşmeya, 'Birêxistinbûna jinên ciwan azadiyê bi dest tînin' bi tevlîbûna 100 delegeyan destpê kir. Jinên ciwan ên Şengal, Mexmûr û Rojhilatê Kurdistanê jî tevlî bûn.
Axaftina vekirina konferansê ji aliyê Kanî Çiya ve hate kirin. Kanî Çiya got; "Sêyemîn konferansa jinên ciwan ên têkoşer li Rêber Apo, tevahiya malbatên şehîdên rizgariya Kurdistanê, jinên Kurd û cîhanê pîroz be. Em vê konferansê pêşkêşî ruhê şehîd Viyan Soran dikin. Sîstema sermeyedarî bi şerê aborî, medya, derûnî û fikrî hewl dide, îradeya me bişkêne. Em jinên ciwanên têkoşer di serî de şerê vê sîstemê dikin. Piştre jî di nava civakê de bi rêxistinkirina jinan û îradebûnê têdikoşîn."
Piştre peyamên jinên ciwan ên Mexmûr, Şengal û Rojhilatê Kurdistanê hatin xwendin.
Piştre rapora du salan a kar û xebatê ya Rêxistina Jinên Ciwanên Têkoşer hate xwendin. Herwiha perspektîfên Rêber Ocalan ên di derbarê têkoşîna jinan hatin pêşkêşkirin.
Wê di konferansê de pirsgirêkên jinên ciwan û riyên çareseriyê werin nîqaşkirin. Herwiha wê rewşa siyasî , kar û xebata jinên ciwan were şîrovekirin.
Konferans didome.

## Wayne Marotto: Kurd bûne mînaka hevkarekî jêhatî û pêbawer

Berdevkê Hêzên Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ`ê Wayne Marotto bi boneya salvegera 6`emîn a rizgarkirina Kobanê ji çeteyên DAIŞ`ê, peyama pîrozbahiyê şand.

Berdevkê Fermî yê Hêzên Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ`ê Wayne Marotto li ser Twîtterê bi zimanê kurdî û inglizî peyama pîrozbahiyê weşand û tê de wiha got: "Îro roja azadkirina Kobanê ye. Di 26`ê Çileya 2015`an de şervanên Kurd, bi piştgiriya ezmanî ya @CJTFOIR, Kobanî azad kirin û têkbirina DAIŞ`ê baş nîşanî cîhanê dan. Her wiha, armanca wan a stratejîk jî red kirin. Em Kurdan pîroz dikin ku îro bûne mînaka hevkarekî jêhatî û pêbawer."






# Hunermend bi hunera xwe bersiva êrişan didin

**Leylan RESO/Qamişlo**

Di pêşketina her civakê de bandora hunermendan tê dîtin. Hunermend bi hunera xwe jî dikarin bandora êrişên dagîrkeran bişkînin. Li bakur û rojhilatê Sûriyê tevî zehmetiyan, hunermend bi hunera xwe bersivê didin dagîrkeran.
" Hê di refa 5an de min xwe fêrî stiranan dikir"
Têkildarî hunera xwe hunermendê ciwan yê ji gundê Eynhisanê yê girêdayî bajarê Serê Kaniyê Demhat Gur wiha axivî: "Hê di refa 5an de min xwe fêrî stiranan dikir. Bavê min jî li tembûrê dixist. Her ku dengê tembûrê diket guhê min, hestên min yên derbarê huner de xurttir dibûn. Sala 2011an fêrî tembûrê bûm."

### "JI BER ÊRIŞAN EM NEÇARÎ KOÇBERIYÊ BÛN"

Demhat Gur axaftina xwe wiha domand: "Sala 2014an, ez derbasî çand û huner ya bajarê Serê Kaniyê bûm. Ji bo pêşketina xwe şahiyek li kû hebûya ez li wir bûm. Ji bo ku pirtir fêrî amûrên mûzîkê bibim sala 2019an derbasî Akademiya Yekta ya Ş. Herekol bûm. Li wir fêrî agahiyên mûzîkê û bilûrê bûm. Piştî perwerdeya Akademiyê vegeriyam Serê Kaniyê û li wir bûm mamosteyê mûzîkê. Min ciwan û zarok fêrî bilûr û gîtarê dikirin. Lê mixabin ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker em neçarî koçberiyê bûn û em li bajarê Amûdê bi cî bûn. Li wir jî min mamosteyî kir."

### "HUNER EŞKEREKIRINA HEST Û HELWESTAN E"

Demhat Gur axaftina xwe wiha qedand: "Min 3 stran amade kirine. Yek li ser azarên Serê Kaniyê ye, wê piştî heyvekê bê weşandin. Ez ji huner pir hes dikim, lewre huner eşkerekirina hestên min e. Daxwaziya min ji ciwanan jî ew e ku li hunera xwe xwedî derkevin. Lewre paşroja vî welatî em in û parastina çandê erkê me ye.



# Hezkirin û xwestek pencereya geşkirina afrîneriyê ne

Her çi qasî bi temenê xwe biçûk e û ji ber aloziya Sûriyê zor û zehmetî dîtin, lê hezkirina wê ji nivîsandina romanan, kurteçîrok û helbestan re sînor nas kir, malbatê destek da behreya wê û xewna xwe bi cih anî.
Ji beriya deh salan ve li Sûriyê şer rû dide, di encamê de bi hezaran sûrî koçber bûn, mal û milkên wan wêran bûn.
Tevî şerê li Sûriyê gelek behre derketin holê, ji van behreyan; behreya ciwana bi navê Semaa Îsa ku beriya 4 salan li bajarê Minbicê yê Sûriyê bi cih bû. Ji ber li vir aramî û ewlehî peyda dibûn û gelê Sûriyê berê xwe didan wir.
Semaa Îsa ya ji bajarê Helebê (17) û ji malbateke xwedî 9 kulfetan e, ji zaroktiya xwe ve dest bi nivîsandina roman, helbest, wênexêzî û kurteçîrokan kiriye.

### DI QADA NIVÎSANDINÊ DE SERKEFTÎ YE

Semaa Îsa destnîşan kir ku di 8 saliya xwe de dest bi nivîsandina kurteçîrokên zarokan kir, cara yekemîn nîşanî malbata xwe kir, malbatê destek dayê û vê yekê hişt ku xewna xwe bi cih bîne.



Têkildarî nivîsandina romanan Esmaa Îsa ev yek anî ziman: "Min dest bi nivîsandina romanan kir, min romanek ser parçekirina malbatê, berdan û bandora wê li zarokan nivîsand, lê ji ber sedemek di laptopê de çêbû, roman hate xerkirin, ji ber vê min demeke dirêj nenivîsand, lê piştre li nivîsandinê vegeriyam, min romanek bi navê Îma nivîsand û dê di demeke nêz de were çapkirin."
Semaa Îsa da zanîn ku ew qet nedixwest romana Êma çap bike, heta hêviyên wê tunebûn ku derveyî malbatê tu kes bixwîne, lê malbatê ew teşwîq kir û pêşniyar kirin ku biçe Yekitiya Rewşenbîrên li Minbicê, da ku li romana wê vegerin. Bi vî awayî yekitiyê roman sererast kir û şandin çapxaneyeke li bajarê Qamişlo.
Îma lehenga romanê ye, roman jî behsa hezkirina jineke gundan dike ku çûye bajêr û dem jê re divê ku hogirî jiyana civaka bajaran bibe, paşê bi wan re dibe yek, ji yekî li bajêr hez dike û pê re dizewice.
Semaa di romanê de aliyên hestiyariyê, aliyên bedbîniyê bi şêweyekî wêjeyî dihone.
Niha jî hewldana nivîsandina romaneke din dike, ew jî vegera romana ku hatiye xerabkirin. Romana ku xerab bûbû; behsa doza berdanê û dîroka Helebê dikir.

### HEZKIRINA WÊ JI HELBESTÊ RE



Semaa li kêleka xwendinê, nivîsandina romanan ji nivîsandina helbestan jî hez dike, beriya niha beşdarî şevbuhêrkeke helbestî ya li Navenda Yekitiya Rewşenbîran bû, li wir helbestek bi navê "Min temen li ser refikeke kevnare hişt" xwend.
Niha jî Semaa helbestekê ser welat û jiyana gelê Sûriyê dinivîsa, Semaa da zanîn ku ji ber ew gelekî helbest û romanan dixwîne behrehaya wê geştir bûye.
Her wiha helbest bi navê "Bi min re biaxiv ey welatê min" nivîsand.
Semaa bi bîr xist ku diya wê çûye mala wan a li Helebê, dît ku ji ber topbarana beriya 4 salan mala wan hatiye wêrankirin, ji ber vegeriya mala xwe ya li Minbicê û ji Semaayê re behsa xerabkirina malê kir û ev di hiş û ramê wê Semaayê de ma, lewra helbest der barê wêraniya bi mala wan de hatiye nivîsand.

### NE TENÊ HELBEST, ROMAN, LÊ WÊNEXÊZÎ JÎ

Semaayê di qada wênexêziyê jî afrînerî çêkir û wiha vedibêje:"Ji zaroktiya xwe ve min jî wênexêziyê hez dikir, ji ber mirov tişta ku mirov nikaribe binivîse mirov dikare bi rêya wênexêziyê derîne, ji ber vê wênexêzî pencereya rih e."
Semaa bi lêv kir ku gelek tabloyên wê yên sade hene û bi hêvî ye ku behreya xwe hîn zêdetir geş bike, ji ber roman û kurteçîrok û xwenda li dibistanê gelekî wexta wê dixwin.
Semaa Îsa di dawiya gotina xwe de eşkere kir ku ew hewl dide hevsengiyê nav behre û xwendina xwe de çêke, ji ber ji xwendinê hez dike û ew pêşeroja wê ye, li gel vê yekê behre pey xwendin bi ser nakeve.



## Stêrkek Geş Ji Nava Strana Kurdî Xuricî

**Sîpan Şînda**

Heçî Botan e warê evînê ye, warê helbestê ye, kaniya stran û dengbêjiyê ye. Dema peyva dengbêjiyê tê bilêv kirin, raste rast Botan tê bîra mirovî. Botan, warê dîrok û kelepora Kurdî û Kurdistanê, navenda çand û zimanê Kurdî, dilê helbest û evînê, dîrok û hikumdariyê ye. Belê dema wî çavên xwe dineqandin û li têlên tembûrê dixist, têkiliya wî ji dinyayê qut dibî, ew di nava pêlên dengê xwe û stranê de winda dibî. Stran, weke ava kaniya ji binê tehtê derbikeve û bi pêlên sipî biherike, ji nava dilê wî derdiket û di qirika wî de diherikî û li ser zimanê wî diheliya. Çawe xwişîna avên çem û kaniyan dilê mirovî fireh dike hizûrê dide mirovî, dema Esker Cizîrî ji stran digotin mirov mest dibû, dilê mirov fireh dibû, giyanê mirov şad dibû. Peyv li ser zimanê wî diheliya, weke bayê difiriya dihat giyan û mejiyê mirovî. Esker Cizîrî, ango weke Mihemed Arifê didûyan dihate naskirin, di 8'î meha çila 2021'an de çû li ser dilovaniya xwe. Ew ji bû dengbêjî û strana Kurdî stêrkeke gelek geş bû. Dema ewî di striya, stran ji nîva kezeba wî derdiket. Dema ew Qasimê Meyro, Zozaniyê, Xulîs Xweşin yan ji Xezal Xezal dibêje, pêlên dengê dilê wî li esîmanên dilê mirovî dikeve, dilên vemirî weke stêrkan geş dibin. Ew di sala 1955 an de li Cizîrê li taxa Kelhê tê li ser dinê. Dengbêjiya Esker ji babê wî tê. Babê wî Eliyê Mistefa ji dengêbej bûye. Hêj ew kiçik babê wî dibîne ku dengê Esker xweş e û ji wî re tembûrekê dikire û wî dielimîne stranan. Esker ji bi işq stranan dibêje û xwe fêrî tembûrê dike. Ew kesekî ehlê keyf û şahiyê bû. Ewî di civatên dost û hevalên xwe de gelek stran gotine. Jixwe dera ew lêbûya stran û keyf û şahî ji hebû. Esker ne tenê stranên gelerê gotine, herweha ewî bi xwe ji gelek stran çêkirine. Ewî 2 kaset û gelek CD ji derxistine. Esker Cizîrî herweha stran li ser niştimanperweriyê ji çêkirine û gotine. Her çend ew neçûbû mektebê ji bes ewî gelek stranên Kurdî jiber kiribûn û ewî digot ez dorê 600 stranan jiber dizanim. Di sala 1992'yê de li Başûr tevilî avakirina televizyona Xebat dibe. Ewî di gelek bajarên cuda konser dane, tevil gelek mîhrîcan û bernameyên televizyonan bûye û stran gotine.
Ewî di meha Remezanê de Lûzîne çêdikirin û debara xwe bi Lûzînê dikir. Ew bi xwe dibêje heta min Lûzîne çênedikir min nan nebî, lê piştî min Lûzîne çêkir min nanek jê xwar. Ev nêzîkî çar salan ew nexweş ketibû û bi nexweşiya dil ew çû rehmetê. 9 zarokên wî hene û ew li Cizîrê dijîn. Esker Cizîrî kesekî evîndarê strana Kurdî bû. Hêvîdarim zarokên wî ji li ser dewsa wî bibin evîndarê strana Kurdî û li mîratê babê xwe xweyî derbikevin. Ji Seît Axa bigire hetanî Meyrem Xan û Mihemed Arif, ji Hesen Cizîrî bigire hetanî Fadil û Cemalê Mihê ji Salihê Şirnexî bigire hetanî Esker Cizîrî dengbêjî li Botan venemiriye û her ku çûye geştir bûye. Çand û hunera Kurdî ji bi wî agirê dilê evîna wan gur bûye. Giyanê te her tim şad be û gora te biheşt be mamê Esker Cizîrî. Pêlên dengê te wê her tim li ber guhê min be.

# Rojava bingehê kar û aboriyê datîne

Darîn SILÊ/Qamişlo

Desteya Aborî ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, bi pêşengiya şerîkeya El Hesen, 26ê Çile li gundê Melesibatê yê bajarê Qamişlo, bi nave "Golden Rose" kargeheke zeytê vekir.

**DEMÊN PÊŞ WÊ GELEK PROJEYÊN BI VÎ RENGÎ PÊK WERIN**

Hevserokê Desteya Aborî ya Rêveberiya Xweser Selman Barûdo, li ser vekirina kargehê wiha axivî: "Ji bo xurtkirina aboriya herêmê û kêmkirina anîna pêdiviyan ji derveyî welat, me dest bi avakirina kargeha zeytê kir. Li seranserê bakur û rojhilatê Sûriyê ev kargeha yekê ye û lêçûna wê jî nêzî 6 milyon dolarî ye. Wê rojane nêzî 300 tonî zeyt, ji tovê pembû, garis, gula berberoj, soya û kunciyan derkeve."

Selman Barûdo axaftina xwe wiha Qedand: "Em vê kargehê li gelê xwe pîroz dikin. Herwiha di dema pêş de wê gelek projeyên bi vî rengî li bakur û rojhilatê Sûriyê pêk werin."

**DI PEYDEKIRINA PÊWÎSTIYÊN KARGEHÊ DE ME ZEHMETÎ DÎT**

Derbarê mijarê de xwediyê şerîkeyê Ehmed Reşîd ev agahî dan: "Ez berpirsê kargehê me, lê proje ya Rêveberiya Xweser e. 15ê Adara 2020an me dest bi avakirina kargehê kir. 350 karkerê wê hene. Ji ber ambargoya li ser herêmê me di peydekirina pêwîstiyên kargehê de zehmetî dît. Ji ber qedexeya korona jî proje sê mehan hat sekinandin. Cihê kontrolkirina zeytê û paqijkirina wê jî li kargehê heye. Sê cureyên parastina tov û dagirtina zeytê hene, (1L, 4L,16L). Ji ber ku bawernameya kargehê ya ÎSO heye, em dikarin zeytê bifiroşin her welatî."










# Ji bo parastina tenduristiya gel her tim dixizmetê de ye

Dilîn EHMED/Qamişlo

Ji bo parastina tenduristiya welatiyan li bajarê Amûdê 12 Berfanbara 2012 Heyva Sora Kurdî hat avakirin. Piştî êrişên dewleta tirkî li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ku heta niha didome, Heyva Sor li her cihê ku pêwîstiya gel bi wan heye, xebatkarên xwe bi cî kirin. Ji bo koçberan jî li hemû kampên Rojava nexweşxaneyên xwe ava kirin e. Ji bo li xwedî derketina li koçberan û parastina tenduristiya wan, Heyva Sor Kurdî ji destpêka avakirina Kampa Newroz dest bi karê xwe kir.

Derbarê mijarê de berpirsê girûpa Heyva Sora Kurdî Ehmed Mistefa, ji me re wiha axivî: "Ji destpêka avakirina kampa Newroz me nexweşxaneya xwe, ji bo parastina tenduristiya koçberan ava kir. Rewşa xebata me bi giştî baş e, em 24 saetan di xizmetê de ne. Ji bo rewşa tenduristiya malbatên kampê bi rastî, di demsala zivistanê de ji ber sermaya zêde û sobeyên kazê, zehmetiyan dikişînin û gelek ji wan jî nexweş dikevin. Nexweşiyên sivik em li kampê derman dikin, lê wek şewat yan jî nexweşiyên giran em wan dişînin nexweşxaneyên bajêr."

**JI BO FÊRKIRINA XWEPARASTINÊ KOMÊN PISPOR LI NAVA KAMPÊ DIGERIN**

Ji bo parastina kampê ji koronavîrûs û tedabîran Ehmed Mistefa axaftina xwe qedand: "Ji bo parastina kampê ji nexweşiya koronavîrûsê, me navend û kolanên sereke tev paqij kirin e. Herwiha ji bo kesên ku gomana nexweşiyê li wan heye jî, me odeyeke gerok amade kiriye. Ji bo fêrkirina xweparastinê jî komên pispor li nava kampê digerin. Zehmetiya ku em dikişînin ji aliyê paqijiya zarokên kampê ne, tevî ku komên pispor kon kon digerin û li ser paqijiyê semîneran didin, lê gelek ji wan pabend nabin û tedabîrên xweparastinê paşguh dikin. Em jî li gor derfetê heyî bi wan re dibin alîkar, lê em bi hêvîne ku malbat jî ji bo xwe û kampê bi giştî, bi me re bibin alîkar."





Koçbera bi navê Îman Elhemad ya 43. ku dayîka 5 zaroka ye, li ser rewşa tenduristiya kampê wiha axivî: "Ji destpêka hatina me ve Heyva Sora Kurdî alîkariyê bi me re dike. Em zivistanê zehmetiyê dikşînin, ji ber sobeya kazê keça min ya bi navê Xîtan Salim nexweş ketiye. Ev demeke ji ber kuxukê nikare bêhna xwe bikşîne û ne jî dikare razê. Ti çare di destê me de nîne, lewra em tên gel bijîşkên Heyva Sor Kurdî û ew bi me re dibin alîkar û dermanên pêwîst ji me re pêşkêş dikin. Em spasiya wan dikin ji ber ku karekî pîroz li kampê dikin, ne ji wan ba wê halê me ne te hal ba."

# "Ez sûdê ji xwedîkirina mêşên hingiv digirim"

Rojda SEYİDXAN

QAMIŞLO - Xaliya Elî ya 40 sal in mêşên hingiv xwedî dike diyar kir xwedîkirina mêşên hingiv sebir û baldariyê dixwaze û wiha got:"Ez sûdê ji xwedîkirina mêşên hingiv digirim."

Xaliya Elî ya 70 salî li Gundê Hîmo yê Kantona Qamişloyê dijî ev 40 sal in mêşên hingiv xwedî dike. Xaliya tevî temenê xwe yê mezin xebatên xwe didomîne û niha jî 10 kuwarên mêşan xwedî dike. Derbarê rêbazên xwedîkirina mêşên hingiv de Xaliya ji me re axivî.

**"JI BO XWEDÎKIRINA MÊŞÊN HINGIV BALDARÎ DIVÊ"**

Xaliyayê li ser rêbazên xwedîkirina mêşên hingiv wiha got: "Ev dora 40 salî ye ku ez mêşên hingiv xwedî dikim û niha jî 10 kuwarên min ên mêşan hene. Ji sibehê de karê min dest pê dike û heta saetên êvarê li mêşên xwe mêze dikim. Mêşên hingiv di nava xweza û kulîlkan de dijîn, ji bo wê pîwîst e qederek şênkahî li derdor hebe. Li derdora kuwarên xwe min kulîlk çandine, da ku mêşêm min nêçîra xwe bikin. Bi qasî ku berhemên mêşên hingiv baş e, ewqas zehmetiyên wê jî hene. Berî 15 salan min di salê de du caran kuwar vedikir û hingiv derdixist, niha nexweşiyên min hene û zehmetir bûye, ji bo wê her salê carekê ez kuwarên xwe vedikim. Xwedîkirina mêşên hingiv baldarî û sebir jê re divê."

**"DAXWAZA HINGIVÊ MALÊ TÊ KIRIN"**

Xaliyayê nexweşî û sedema nexweşiya mêşên hingiv wiha anî ziman:"Dema ku mêş nexweş dikevin, ev dibe sedema ku berhem jî nedin. Taybet di van salên dawiyê de nexweşiya mêşan pir pêş ketiye. Li gel min jî mêşên hingiv nexweş ketin, bi alîkariya bijîşkan min derman ji wan re girt kir nava avê û da wan heya baş bûn. Bi sedema nexweşiyê îsal sê kuwarên min bê hingiv bûn. Li aliyê din jî dema mêşên hingiv ne di nava xwezayê de nêçîr bikin, helbet wê nexweş bikevin, ger hingiv bide jî wê kêm be û hemû şekir be. Ez bi xwe mêşên xwe bi xwezayê re xwedî dikim û ji berhemên wan jî sûdê werdigirim. Hingivê saxlem li bazaran kêm e, ji bo wê gelek kes daxwaza hingivê malê li min dikin."



**"XWEDÎKIRINA MÊŞAN JÎ PISPORÎ JÊ RE DIVÊ"**

Xaliyayê behsa dema xwedîkirina mêşên hingiv kir ku di sibat û adarê de geşbûna wê ya herî zêde ye û wiha pê de çû:"Di meha sibat û adarê de mêş li xwe zêde dikin û mêşên nû çêdibin, di van herdu mehan de geşbûna wê ya herî zêde ye. Ji bo mêşên ku nû çêdibin, ez kevçî û sênîkê li hev dixim dengê vê yekê ji wan re balkêş tê, hemû li ser darê kom dibin, wan dixim çewalên taybet û paşê berdidim kuwarê. Bi vî rengî mirov ji xwe re hejmareke mezin ji mêşan qezenc dike. A din jî ez kuwarên mêşên xwe bi destên xwe çêdikim, kuwar ji ax û kayê tê çêkirin, paşê qalibê wê heye ez lêdidim û wisa li ber tavê du rojan zûha dikim. Xwedîkirina mêşan jî pisporî jê re divê."

**"EZ SÛDÊ JI XWEDÎKIRINA MÊŞÊN HINGIV DIGIRIM"**

Xaliyayê di dawiyê de bal kişand li ser mêşingên mêşan ku jê şimayê çêdike û wiha gotina xwe bi dawî kir: "Dema ez kuwaran vedikim, di destpêkê de ez agir vedidim, mêş ji ber dûmanê xwe dûr dixin û wisa kuwarê vedikim. Piştî wê mêşingên hingiv ji kuwarê derdixim û kuwara xwe dîsa digirim. Paşê mêşingan ji hingiv zûha dikim û van mêşingan dikelînim û dikim şima. Şima ji mêşengê çêdibe, ji gelek nexweşiyan re pir baş e û dikeve nava xwarinê jî. Bi vî rengî mêş xwedî dibin. Ez sûdê ji xwedîkirina mêşên hingiv digirim."

# Kampanya 'Ez alîkar im' bûye hêvî

Hejmareke mamosteyên jin yên Rêveberiya Xweser, bi armanca alîkariya malbatên xizan yên Qamişlo, di Nîsana 2020`an de dest bi kampanyaya "Ez alîkar im" kir. Di salekê de bi 23 milyon lîreyên Sûriyê alîkariya malbatên xizan kir. Mamosteyên ku kampanya bi rêxistin kiriye, komîteyek ji 11 kesan ji bo belavkirina alîkariyan rabe ava.


Ew komîte rewşa malbatan lêkolîn dike û li gorî wê navan qeyd dike. Bi rêya kampanyaya "Ez alîkar im" heta niha alîkariya 200 malbatan hatiye kirin. Her wiha di rewşa vîrusa Korona de alavên nefesê ji 4 malbatan re hatine peydakirin û ji bo wê mehane pere ji wan re tê veqetandin. Alîkariyên tên dayîn ne tenê madeyên xwarinê û pêdiviyên tenduristiyê ne, di cejnan de ji zarokên malbatên xizan re cil û diyarî jî tên pêşkêşkirin.

Ji dema destpêkirina kampanyayê ve heta niha 15 milyon lîreyên Sûriyê wekî pere ji malbatan re hatine dayîn û 8 milyon jî bi rêya madeyên xwarinê, cil, pêdiviyên tenduristî û hwd hatine dayîn.

Têkildarî mijarê, mamoste Talîn Abdulah ku yek ji berpirsên kampanyayê ye, wiha got: "Dema me rewşa malbatên xizan didît, em bi berpirsyariyê dihesîn. Lewra me biryar da ku em destekê bidine wan."

Talîn diyar kir ku ji bo komkirina pereyan 3 kom li ser malperên medyaya civakî hatine çêkirin.

Talîn daxuyand ku kampanyaya "Ez alîkar im" ne tenê ji bo malbatên xizan e, ew li gorî derfetên xwe alîkariya xwendekaran jî dikin û wiha domand: "Hin xwendekar nexweşiyên derûnî bi wan re hene, em malbatên wan agahdar dikin û bi rêya kampanyaya xwe wan dişînin dibistanên taybet."



Mamoste Talîn Abdulah destnîşan kir ku dê kampanyaya "Ez alîkar im" berdewam bike û got roj bi roj bawerî bi kampanyayê zêdetir dibe.

*ANHA*



# Hûn nikarin bi reşkujiyan me tine bikin

Ş. Seida El-Hermas û Hind El-Xidêr li Şedadê bi awayekî hovane hatin şehîdxistin. Bi vê reşkujiyê xwestin vîna jina berxwedêr bişkînin. Ji ber wê jinan li seranserê bakur û rojhilatê Sûrî ev êrişa hovane şermezar kir û soza tolhildana wan hat dayîn.

Jiyan Bozo/Amûdê

**"LI HEVRIYÊN XWE XWEDÎ DERKEVIN"**

Têkîldarê mijarê endama Rêveberiya Dibistanan ya Amûdê Hena Xalid wiha axivî: "Bûyereke pir biêş bû. Du jinên berxwedêr bûn. Em bi şehadeta wan pir êşiyan. Xwestin bi vê reşkujiyê vîna jina azad bişkînin. Çimkî cara yekê ye ku li Rojhilata Navî û bi taybetî li Sûriyê jin hevserokatiyê dikin. Lê heta niha hişmendiya mêrê serdest, hêzên dagîrker û çeteyên wan azadiya jinê napejirînin. Jinên xwe bi rêxistin kirîn û di her qada jiyanê de ciyê xwe girtîn, dibin hedefa wan. Ev komkijiyeke li dijî mirovayiyê tevê ye. Her du jinên ku rêveberiya gelê xwe dikirin mînaka jinên azad bûn. Di her şoreşê de jin dibin hedef. Çimkî hêzên hegemon ji hêz û vîna jinan ditirsin. Ji ber wê van reşkujiyan dikin."

Hena Xalid axaftina xwe bi van gotinan qedand: "Em soz didin ku li gorî rêgez û pîvanên xwe yên azadiyê tev bigerin û şopdarên wan bin. Emê mafên jinan misoger bikin û vê hişmendiya mêr bişkînin. Bi vîna jina berxwedêr emê planên dagîrkeran û çeteyên wan têk bibin. Banga min ji jinan tevan re heye, li hevriyên xwe xwedî derkevin û bi yek dengî bêjin êdî bes e."

**"ME HÊZA XWE JI SARA, LEYLA Û FÎDANAN GIRTIYE"**

Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk şaxê Amûdê Minewer Xalid jî ev nirxandin kir: "Em tevgera jinan êrişên ser bakur û rojhilatê Sûrî bi dijwarî red dikin. Bi taybetî êrişên li ser jinan. Hedefa dagîrkeran tinekirina civaka hevgritî ye. Çimkî ev civak bi keda jinên berxwedêr gihîştiye vê astê û azadiya gelan misoger kirine. Ji ber wê her du jinên me yên li ser karê xwe bi hovîtî hatin revandin û şehîdxistin. Li dijî jinan ev ferman e. Vê li bakurê Kurdistanê di kesayeta Leyla Guven de dest pê kir û li hemberî Seida û Hindê dewam kir. Lê bila baş bizanin ku projeya Rêber Apo ya Neteweya Demokratîk wê bi ser bikeve. Em tevgera jinan, bi taybetî jinên bakur û rojhilatê Sûrî van êrişan red dikin û ti carî serî ji wan re danaynin. Çi dibe bila bibe emê têkoşîna xwe bidomînin. Ti hêz nikarin vîna me jinan bişkînin, çimkî me hêza xwe ji Sara, Leyla û Fîdanan girtiye."





Minewer Xalid axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi hêza jinên di çeperan de şer dikin, herwiha bi vîna jinên li girtîgehan têdikoşin û bi ked û berxwedana bi hezaran şehîdan emê bi ser bikevin. Em careke din di kesayeta van berxwedêran de soza xwe nû dikin û dibêjin; jin misogerên jiyana azad in."

# KJAR'ê zextên dewleta Îranê şermezar kir


Komelgeha Jinên Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KJAR), pêla binçavkirin û girtinê ya ji aliyê rejîma Îranê ve şermezar kir û ragihand ku divê jin bêdeng nemînin.

Komelgeha Jinên Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KJAR) bi daxuyaniyekê pêla girtin û binçavkirinê ya ji aliyê rejîma Îranê ve şermezar kir. Di daxuyaniyê de wiha tê gotin;"Careke din rejîma Îranê ji ber bê çareya li beramberî îrade û berxwedana gelê Kurd dest bi pêla binçavkirin û girtina Kurdên Rojhilatê Kurdistanê kiriye.

Gelê Kurd ji destpêkê ve biryara xwe daye ku li beramberî bêhiqûqî û bêedaletiyê bêdeng nemîne. Heta dawiyê li beramberî vê sîstema çewsîner a rejîma Îslamî ya Îranê berxwe bide. Lewma wê bi hewldana dewleta Îranê ev gel çav tirsandî nebe. Belku bi girtin û êşkencekirina zarokên xwe ji bo tolsitandinê kîna wan zêdetir bibe."

KJAR'ê bal kişand li ser zextên li ser jinan û wiha tê destnîşan kirin;"Bi armanca bêdengkirinê, bi hîncetên cuda yên di warê siyasî, civakî û çandî rawabûn dane êrişên li ser jinan. Pêwîste gelê Kurd û bi taybet jin li hemberî vê pêla rejîma Îranê daye destpêkirin bêdeng nebin. Ji ber ku ev siyaseta qirkirinê ya rejîma Îranê dide meşandin ji hev cuda nîne, divê vê jî ji bîr nekin ku niha bi dehan kes ji bo parastina vê çandê di girtîgehên Îranê de girtîne."

# 3 jinên çalakvan veguhestin girtîgehek Supayê Pasdaran



Operasyona qirkirina siyasî ya li dijî çalakvanên civaka sivîl yên Rojhilatê Kurdistanê dewam dike.

3 jinên hatibûn binçavkirin, veguhestin girtîgehek Urmiyeyê.

Operasyona qirkirina siyasî ya ku di 8'ê Çileya 2021'an de li Rojhilatê Kurdistan û Îranê dijî çalakvanên civaka sivîl, xwendekar û welatiyan hatiye destpêkirin dewam dike. Heya niha 34 kes ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine binçavkirin û aqûbeta wan nayê zanîn.

Li gorî nûçeya Komeleya Mafê Mirovan ya Kurdistanê, duh jinên bi navê Ezîme Nasrî, Derya Talebanî û Esrîn Mihemed ku di 9'ê Çileyê de hatibûn binçavkirin, veguhestine girtîgeha Îtalat ya supayê Pasdarên Îranê a li bajarê Urmiyeyê.

Aqûbeta çalakvan, xwendekar û welatiyên din yên ku hatine binçavkirin, nayê zanîn.

# Hikumeta Tirkiyê biryara girtina berdevka TJA`yê da



Dadgeriya dewleta Tirk biryara girtina berdevka Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkar da.

Rûniştina doza li dijî Berdevka Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkar ku bi îdiaya "rêveberiya rêxistinê" û "endametiya rêxistinê" tê darizandin, li 9'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê pêk hat. Gokkan tev li rûniştinê nebû. Parêzerê wê Nevzat Karaaslan beşdar bû.

Parêzer Nevzat Karaaslan diyar kir ku ew gotinên şahidê nepen ê li dijî muwekîla xwe qebûl nakin û xwest di rûniştina bê de muwekîla wî amade be nêrîna wê bê wergirtin.

Heyeta dadgehê piştî navberekê biryara xwe eşkere kir û bi hinceta 'delîlên berbiçav' ên dosyayê û tevlîbûna Gokkan li rûniştinê, biryara girtina wê da.

# YPJ: Serkeftina ku li Kobanê hatî jiyîn, em ê li bajarên dagirkirî jî bidin jiyîn

Fermandariya Giştî ya YPJ'ê di salvegera 6'an a rizgarkirina Kobanê, hemû şehîdên têkoşînê bibîr anîn û got: "Azadî û serkeftina ku li Kobanê hatî jiyîn, em ê di her sê bajarên xwe yên di bin dagirkeriyê de jî bidin jiyî. "

Fermadariya Giştî ya YPJ'ê bi boneya salvegera 6'emîn a Berxwedana Serdsale ya Kobanê daxuyaniyek da û ev got: "Bi boneya salvegera 6. a rizgarkirina warê berxwedanê Kobanê di serî de li rêberê gelan rêber Apo, hemû rêhevalên me yên ku bi ruhên xwe yên fedayî ku îro bûne sembola berxwedana gelan, malbatên şehîdan, tevahî şervanên li ser rêya heqîqetê tekoşîn dikin, hemû dostên gelê Kurd û tevahî mirovahiyê pîroz dikin."

Şerê li Kobanê li hember hovîtiya dijminê mirovahiyê DAIŞ'ê hate kirin. Berxwedana gelê herêm bi felsefeya jiyanên azad kêlî bi kêlî bi lehengiya neviyên xwedawendên Mezopotamya yên mîna Arîn û Rêvanan navê xwe li dîroka mirovahiyê bi tîpên zêrîn nivîsandin. Her çiqasî 6 sal li ser berxwedana Kobanê re derbas bû, em dikarin bêjin şervanên navên xwe di dîroka mirovahiyê de nivîsandine, îro bûne pêşengên tevahî jinên tekoşer. Di roja îro de di her qada jiyanê de şopdarên rêya Arîn û Avestayan bi ruhê berxwedana Kobanê, bi qehremaniya şervana têkoşer di Berxwedana Serdemê de canê xwe feda kirin ji bo azadiya tevahî gelan, em dibînin îro bi hezaran jinên têkoşer û jinên ku dilê wan ji bo jîna azad lêdidin, tekoşîn dikin û li ber xwe didin.

Dengê azadiyê ya ku di dîroka 26'ê Çileyê ku bi dengê berxwedaniyê ku misogerî de di wê roja dîrokî gihijte lutkeyê, bi serkêşiya bi sedan keçen qehreman û çeleng ku dengê wan ji erdê hetanî asîmanan, ji bo ku dengê xwe bigihînin mirovahiyê, her yek ji wan bi desmala serkeftinê weke îro li kolanên Kobanê û di çeperên germ de cihê ku azadî lê hatibû dîtin. Îro jî em bi heman dengî ji bo em azadiya Kobanê bigihêjinin dawî, em ê bi ruhê berxwedana Kobanê wan bajarên xwe yên îro dibin dagirkeriya dijminê mirovahiyê ango çeteyên Erdogan û çeteyên DAIŞ'ê de rizgar bikin. Azadî û serkeftina ku li Kobanê hatî jiyîn, em ê di her sê bajarên xwe yên di bin dagirkeriyê de jî bidin jiyîn.

Herî dawî di kesayeta hevrêya xwe Avesta Xabûr de tevahî şehîdên şoreşa Rojava, bibîr tinin û bejna xwe ditewînin. Salvegera 6. a rizgarkirina Kobanê li tevahî mirovahiyê pîroz dikim. Em weke fermandariya YPJ'ê soz û keyifxweşiya xwe ji vê rojê û hemû rojan re dibêjin. Ji bo bilindkirina têkoşîna xwe em ê di hemû çeperan de ala serkeftinê, heta pêkanîna xewin û xeyalên rêhevalên me yên b sedem ku em van rojan bijîn.

# Hûn nikarin warê Mam Zekî dagîr bikin

74 fermanan têra dagîrker û xwefiroşan nekir. Şingala sala 2014an radestî DAIŞê kirîn, vê carê bi gefên dagîrkirinê re rûbirû dimîne. Peymana di navbera Iraq, Tirkiye û PDKê de dewam heman fermanê ye. Nexwe çima Şingal careke din bibe hedefa wan?

**Jiyan BOZO/Qamişlo**

**" LI SER ŞINGALÊ XETEREKE MEZIN HEYE"**

Derbarê mijarê de cîgirê Hevserokatiya Rêveberiya Xweser ya Şingalê Heso Îbrahîm wiha axivî: "Ev gef girêdayî peymana di navbera Iraq û PDK de ye. Em baş dizanin ku ev peyman plana dewleta tirkî ya dagîrker e. Ev Peyman bi awayekî veşartî hat kirin û me baş zanî ku li ser Şingalê xetereke mezin heye. Ji ber wê me nave vê peymanê kir fermana bi navê qanûnê. Dixwazin fermana 2014an dubare bikin û civaka me ya Êzîdî tine bikin. Serdana wezîrê parastinê yê Tirk ji bo pêkanîna vê planê bû. PDK jî bi awayekî fermî hevkariya Tirkan dike. Kesên xwefiroş yên mîna Heyder Şeşo jî li dijî gelê me bi wan re dibin alîkar. Ji bo wê divê em şiyar bin."

**"74 FERMAN BI SERÊ ME DE ANÎN"**

Heso Îbrahîm bi van axftinana dewam kir: "Dewleta tirkî ya degîrker êdî gefên dagîrkirina Şingal dixwe. Lê divê baş bê zanîn ku ev xeter ne li ser Şingalê tenê ye, li ser Kurdistanê tevê ye. Çimkî hedefa wan têkbirina tevayiya destkeftiyên me yên li Şingal û bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Bi behaneya ku PKK li Şingalê heye van gefan dixwin. Lê ev ne rast e, PKK li gel me nîne. Ya rast ji ber ku ji rêxistinbûna gelê me ditirsin van behaneyan derdixin. Em Rêveberiya Xweser û gelê Êzîdî emê heta dawiyê li ber xwe bidin. Çawa ku me nehişt çiyayê Şingalê bikeve destê DAIŞê, em



nahêlin bikeve destê wan jî. 74 ferman bi serê me de anîn, lê me ti carî serî ji wan re dananî û em danaynin jî. Dewleta tirkî dijminekî hov e. Lê çi dibe bila bibe emê Şingalê biparzin. Ji PDKê re jî em wiha dibêjin; we bi salan gelê me yê Êzîdî firot û bi hezaran jinên me bi xiyaneta we li bazaran ha-



tin firotin. Ji ber wê ti cudayî di navbera we û Tirkan de nîne. Em vê care nahêlin hûn fermaneke nû bi serê me de bînin."

Cîgirê Hevserokatiya Rêveberiya Xweser ya Şingalê Heso Îbrahîm axaftina xwe wiha qedand: "Her kesê dibêje ez mafê mirovan diparêzim û ji tevayiya Kurdan re banga min ev e; li gelê Şingalê xwedî derkevin. Ev gel di gelek fermanan re derbas bû. Mafê vî gelî jî heye ku azad bijî. Ji gelê Şingalê re jî wiha dibêjim; çi dibe bila bibe emê li ber xwe bidin, li keda zarokên xwe xwedî derkevin û dagîrkeran têk bibin. Serkeftin ya me ye."

# Pêwîste Dewleta Tirk Û Çeteyên Wê Bên Darizandin

**Idrîs Henan**

Bi rasthatina sêyemîn salvegera êrişên li ser Efrînê, Meclîsa Sûriyeya Demokratîk MSD'ê li Şehbayê semînerek li dar xist. Semînera di bin silogana "Efrîna berxwedêr xwe ragire, Efrîn dê bîmîne, dagirker dê biçin" de bi beşdarbûna rûspî û oldarên eşîran, malbatên ku rastî binpêkirinên dewleta tirk û çeteyên wê hatine û nûnerên meclîsên civaka sivîl li hola çand û hunerê ya Şehbayê hate lidarxistin.

Bi mebesta nîqaşkirina sedemên dagirkeriyê, binpêkirinên dewleta tirk û çeteyên wê li Efrînê, qirkirinên di dewrê de, destdirêjiya li ser jin, xweza, dîrok û çanda Efrînê, MSD'ê di 27 Çeliyê de li Şehbayê semînerek li dar xist.

Dagirkerî Bandorek Neyînî Li Pêşreroja Sûriyê Dike

Di semînerê de li ser du xalan; çilekiyên dîrokî yên dagirkeriya tirk û kiryarên wê di derheqê gelan, baweriyên olî û siyasî de, şêwaz û rêgezên berxwedana li hemberî dagirkeriyê nîqaş bi pêş ketin.

Seroka Meclîsa Rêvebir a MSD'ê Îlham Ehmed ku endama dîwana semînerê bû, di nirxandinên xwe de bal kişand ser tabloya piştî dagirkirina Efrînê derketiye û wiha got: " binpêkirinên ku li Efrînê li ser destê dagirkeriya tirk û çeteyên wê pêk tên, bandorekî neyînî li ser pêşeroja herêmê û Sûriyê çêdike". Îlham Ehmed û beşdaran di berxwedana li dijî dagirkeriyê de tekezî li ser rola Yekîniyên Parastina Gel û Jin YPG, YPJ û Hêzên Rizgariya Efrînê HRE kirin. Her wiha Ehmed destnîşan kir ku wê hemû pêşniyar û encamên semînerê bi raya giştî re bên parvekirin.

Komên Çete Gundên Me Li Hev Par Ve Kirine

Di beşa duyemîn a semînerê de rapora Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê hate xwendin. Di raporê de bîlancoyên revandin, kuştin, qirkirin, dizî, talanî, destdirêjî, şewitandin, qutkirin, xirakirina mezarên olî û vekolîna cihên dîrokî hatin eşkerekirin. Di derbarê mijara kiryaran de, sê şahidên kirêtiyên dagirkeriyê derketin û serpêhatiyên xwe bi beşdaran re parve kirin.

Hecî Mustefa ku ji gundê Merwaniya jêrîn e. Yek ji şahidên kiryarên dagirkeriyê li Efrînê ye. Mustefa di-



yar kir ku dewleta tirk a dagirker bi alîkariya çeteyan û hinek xwefiroşan gund û navçeyên Efrînê li xwe par ve kirine. Hema 10 Hezar darên zeytûnê yên Mustefa û malbata wî bi tuhmeta terorê hatine desteserkirin û birrîn.



Hemû Guvêşekên Zeytûnan Hatine Dizîn

Şahidê duyemîn Necîb Şêxo yê ji gundê Rûta ya girêdayî navçeya Mabat diyar kir ku togaya çeteyan ya Semerqend dest daniye ser gund. Bi tuhmeta ku endamên Rêveberiya Xweser in, gelek mirov hatine revandin û kuştin. Cenazeyên çeteyên ku li Lîbya dimirin tînin û di nav bajar de diteqînin ku qaşo teqînek li bajar çêbûye. Wisa



jî malbatên wan dixapînin û kiryarên xwe dinixumînin. Şêxo tekez dike ku ji 280 guvêştekên zeytûnan li Efrînê zêdetirî 180 hatine dizîn. Ên mane jî komên çete desteserkirine.

Şahidê sêyemîn Mustefa Delo jî anî ziman ku dagirker û komên çete 400 darên wî yên zeytûnê jêkirine. Delo di şahidiya xwe de qetilkirina dayîka Fatme Kino bi bîr tîne û dibêje ku; ew dayîk piştî ku zêr û pereyên wê hatine dizîn bi dara êsmê ve hatiye daleqandin û kuştin. Zarokên wê jî mecbûr dikin ku bibêjin; dayîka wan bi xwe dawî li jiyana xwe aniye.

Hêjayî gotinê ye ku di dawiya semînerê de hemû xalên hatine nîqaşkirin û di derbarê wan de pêşniyar hatine kirin bi raporekê bi raya giştî re hatin parvekirin. Di rapora dawî de hate xwestin ku hemû kiryayên dagirkeriyê bêne belgekirin û ji saziyên navneteweyî yên eleqedar re bêne pêşkêşkirin. Her wiha îşaret bi girîngiya hewldanên diplomatîk hate kirin ku pêwîste hemû kiryarên dagirkeriyê li Efrînê bêne rojevkirin û rastiya binpêkirinên dewleta tirk û çeteyên wê li Efrînê werin eşkerekirin. Ji bo wê jî hate xwestin ku dewleta tirk û çeteyên wê bên dairzandin.



# Îlham Ehmed: Divê gel li hember gefan yekitiya xwe ava bike

Seroka Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed got serdana wezîrê parastinê yê dewleta Tirk ji Bexda û herêma Kurdistanê re, dikeve nava çarçoveya siyaseta dewleta Tirk a berfirehkirinê li herêmê.

FacebookTwitterWhatsAppTelegram

Seroka Desteya Rêveber ya MSD`ê Îlham Ehmed li bajarê Helebê di panelekê der barê dagirkirina Efrînê, hewldanên dewleta tirkî di dîrokê de da ku rûbera dagirkirina xwe li herêm berfireh bike, axivî.

**'DAGIRKIRIN Û QIRKIRINA ÇANDÊ'**

Girêdayî herêmên dagirkirî Îlham Ehmed got: "Dema em behsa mijara Efrînê dikin, em behsa tevayî herêmên Sûriyê ku ji aliyê dewleta tirkî ve hatine dagirkirin dikin. Weke Cerablus, Bab û Ezazê. Lê di Efrînê de gelek tişt lê qewimîn ji koçberkirina bi darê zorê û hilweşandina cihên dîrokî."

Îlham Ehmed wiha domand: "Dewleta tirkî bi rêya siyaseta tirkkirinê dixwaze çanda resen ya niştecihên herêmê tine bike û pêkhateyan li gorî xwe bikar bîne."

Îlham Ehmed li ser panelên ku ji aliyê MSD`ê ve têne lidarxistin axaftina xwe domand: "Siyaseta ku dewleta tirkî dimeşîne diyar dike ku hîn ew dixwaze siyaseta dapîrên xwe yên osmanî pêk bîne."

Girêdayî van siyasetan Îlham Ehmed wiha axivî: "Em nikarin behsa siyaseta dewleta tirkî cûda ji siyasetên navneteweyî bikin. Ji ber jihev ne cûda ne. Dema em behsa wê dikin diyar dibe ku siyaseta dewleta tirkî ya berfirehkirinê dighêje hemû Rojhilata Navîn û divê em bighêjin fikrên ku em karibin li hember projeya dagirkirina dewleta tirkî ji Sûriyê re, bisekinin."

Îlham Ehmed diyar kir ku dewleta tirkî bi navê Îslamê derbasî Rojhilata Navîn bû û di nava 400 salî de siyaseta binpêkirina çandên resen û qirkirina wê li herêmê pêk anî. Îlham Ehmed wiha axaftina xwe domand: "Em dibînin ku dewleta tirkî hewl dide xwe bighîne sînorê ku împratoriya osmanî lê bû. Niha jî ola Îslamê weke alekê bikar tîne û hewl dide îslama sunî li cîhanê birêve bibe."

**'HEVKARIYA EWLEHIYÊ DI NAVBERA HERDU HIKUMETÊN ŞAMÊ Û ENQEREYÊ DE'**

Îlham Ehmed di dewama axafitina xwe de derbarê hevkariya ewlehiya di navbera herdu hikumetên Şamê û Enqereyê de got: "Em diyaloga di navbera dewleta tirkî û rejîma Sûriyê de ya têkildarî hevkariya ewlehiyê matmayî namînin. Ji ber ku piştî wan diyalogan hikumeta Şamê dorpêçek li ser gelê xwe ferz kir."

Îlham Ehmed behsa buhaneyên dewleta tirkî yên pêkanîna êrişên dijî Sûriyê kir ku şerê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) dike û pirsî; gelo ma PKK li Yewnanistan, Ermenistan û Lîbyayê jî de heye heta ku dewleta tirkî mafê xwe destwerdanên di rewşa wan de dibîne?.

**'NAKOKIYÊN DI NAVBERA KURDAN DE ÇÊDIKIN'**

Seroka Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriyê Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed di dawiya axaftina xwe bal kişand ser serdana Parastinê Derve Hulusî Akar ji Bexdayê û Başûrê Kurdistanê kir û got: "Ev serdan dikeve çarçoveya siyaseta dewleta tirkî ya berferhkirinê li herêmê. Dewleta tirkî hewl dide ku kontrola xwe li Başûrê Kurdistanê zêde bike, nakokî û fitneyan di navbera kurdan de çêbike.

Îlham Ehmed teqez kir ku pêwîste navbera pêkhateyên herêmê de hevgirtinek hebe da ku li hember dagirkeriya tirkî bisekinin.

***ANHA***



# Rêveberiya Xwerser: Serkeftina Kobanê ji bo gelên cîhanê tevan mîrasek e

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê got: "Serkeftina li Kobanê pêk hatiye ji bo tevahî cîhanê û mirovahiyê mîras û destkeftiyeke girîng e û di parastina Sûriyê û cîhanê ji terora DAIŞ`ê de, rol lîst."

Bi pêmana 6. ya salvegera rizgarkirina bajarê Kobanê û serkeftina berxwedana wê li dijî çeteyên DAIŞ`ê û piştevanên wê ye. Berxwedana Kobanê veguherî destaneke lehengiyê ku cîhan bi aliyê xwe ve kişand û rastiya parastina nirxan û mirovahiyê bi tevahî cîhanê da nasîn.

Bi vê boneyê û bi hatina salvegera 7`emîn a ragihandina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kobanê ku dikeve 27`ê Çileyê, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Rêveberiyê di daxuyaniya xwe de destnîşan kir ku rizgarkirinê herêmên ku dewleta tirkî dagir kiriye û di serî de Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî, pêwîstiyeke û xwedî heman girîngiya rizgarkirina Kobanê ye, ku bû destpêka hilweşîna pratîk a terorê.

Di daxuyaniyê de hate gotin: "Di demekê de ku piştî serweriya parçeyên mezin ji xaka Sûriyê û Iraqê û ragihandina bajarê Reqayê wekî paytexta xîlafeta Îslamê, hêza rêxistina terorîst a DAIŞ`ê gihaşt lutkeyê û DAIŞ veguherî xeteriyeke mezin û gef li Sûriyê, herêmê û tevahî cîhanê xwar.

Berxwedana li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê hatiye raberkirin ku herêma herî zêde di bin serweriya çeteyên DAIŞ`ê de di wê demê, ne berxwedaneke normal bû. Wê berxwedanê di parastina Sûriyê û tevahî cîhanê ji gefên rêxistina terorîst DAIŞ`ê de rol lîst. Rizgarkirina bajarê Kobanê di 26`ê Çileya 2015`an destpêka hilweşîna rêxistina DAIŞ`ê bû û piştî berxwedana Kobanê veguherî destanekê, serkeftin li pey hev pêk hatin. Pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê di parastina herêmê xwe ji Kobanê heta tunekirina DAIŞ`ê di 23`ê Adara 2019`an de li Baxozê, ji wê berxwedanê hêz girtin.

Kobanê, projeya Rêveberiya Xweser di 27`ê Çileya 2014`an de wekî tecrubeyeke demokratîk pejirnad û ew tecrube bû bingeke sereke ji bo avakirina projeya demokratîk li Sûriyê bi giştî."

Di dewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Ev roj bi bîranînan dagirtî ne, ji wan salvegera 6. ya rizgarkirina Kobanê ku di 26`ê Çileya 2015`an de û Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kobanê dikeve sala xwe ya heftan. Em van her du boneyan bi bîranîna lehengiyên Kobanê û fedekariya şehîdên wê bi bîr tînin. Wan fedekariyên ku rêya rast a berxwedana ji bo avakirina îradeya demokratîk û azad ji gelan re, diyar kir. Bi bîranîna her du boneyan piştrast kirin ku, dewleta tirkî a ku desteka terorîzmê dike, ne tenê li ser herêmên wan lê belê li ser tevahiya gelên ku hewl didin DAIŞ'ê têk bibin û demokratiyê ava bikin, xeternak e."

Di daxuyaniyê Rêveberiya Xweser wiha domand: "Berxwedana Kobanê bû asteng ji pêkanîna projeya dagirkirin û berferhkirinê re, her wiha berxwedana Kobanê bû destanek lehengiyê.Vîna li Kobanê bû nuqteyek hêviyê di têkbirina DAIŞ'ê de, her wiha destwerdana Koalîsyona Navneteweyî li Kobanê da ku DAIŞ'ê têk bibin û liv û tevgera cîhanê bi awayek mezintirîn bû sedem ku di 1'ê Cotmehê bibe roja cîhanî ji bo Kobanê. Em wekî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştrast dikin ku berdewamiya piştgiriya dewleta tirkî ji bo terorê di heman demê de metirsiyek e li ser destkeftiyên li dijî DAIŞ'ê me bi dest xistine, ji ber vê her aliyek ku dixwaze ev metirsî bi dawî bibe divê helwestên xwe li dijî dewleta tirkî û kiryarên wê yên piştî dagirkirina Serê Kaniyê û Girê Spî ku ji nû ve piştgirî daye şaneyên DAIŞ'ê li herêmê, nîşan bide."

Daxuyanî wiha bi dawî bû: "Em piştrast dikin ku girîngiya rizgarkirina herêmên ku ji hêla dewleta tirkî ve hatine dagirkirin weke Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî, bi qasî girîngiya rizgarkirina Kobanî ye. Her wiha em bang li tevahî pêkhateyên herêmê dikin ku li ser xeta berxwedana Kobanê, Efrîn û tevahî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bimeşin, ji ber ku ev berxwedanî rêya herî serfiraz e ji bo gihaştina serkeftin, civakek demokratîk û aramiyê li seranserê Sûriyê. Em şehîdên Kobanê û tevahî şehîdên herêmê bi bîr tînin û silav dikin."

# Çalakiyên greva birçîbûnê li gelek deveran bi biryardariyeke xurt didome

Çalakiyên greva birçîbûnê ên ji bo şikandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û têkbirina zordariya li zîndanan ku hatibûn destpêkirin, li gelek devaran bi biryardariyeke xurt berdewam dikin.

**GREVA BIRÇÎBÛNÊ LI ZÎNDAN DI ROJA 64`EMÎN DE YE**

Greva birçîbûnê ya ji bo şikandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û bidawîkirina zordariyên li girtîgehan ku di 27`ê Mijdarê ji aliyê gitiyên PKK'ê û PJAK'ê ve hatibû destpêkirin, di roja 64`emîn de berdewam dike.

Girtî destnîşan dikin ku li gel zext û zordariyê jî heta tecrîd bi dawî nebe ew ê bi biryardarî çalakiya xwe dewam bikin û bang li gel jî dikin ku xwedî li çalakiyên greva birçîbûnê derkevin.

**GREVA BIRÇÎBÛNÊ LI MEXMÛRÊ DI ROJA 42'EMÎN DE YE**

Li wargeha penaberan a şehîd Rustem Cûdî (Mexmûrê) jî li dijî tecrîda li Îmraliyê, bi pêşengtiya jinan di 18'ê Kanûnê de, çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. Çalakî li Komeleya Malbatên Şehîdan a Mexmûrê di roja 42'emîn de dewam dike. Şêniyên wargehê di çalakiya xwe de bi biryar in û diyar dikin heta tecrîd neyê şikandin û zordariya li zîndanan tê meşandin neyên rakirin ew ê çalakiya bidomînin.

**GIRVA BIRÇÎBÛNÊ LI YEWNANISTANÊ DI ROJA 25`EMÎN DE YE**

Welatiyên li Qempa Lavrîo ya Yewnanistanê dimînin jî, ji bo bi dawîkirina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û xwedîderketina li çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan dest bi greva birçîbûnê kirine, bi îsrar çalakiyan xwe didomînin. Çalakiya ku bi pêşengtiya Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ) Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê hatiye destpêkirin, di roja 25'emîn de dewam dike.





## Fener



### Gelo Her Tişt Tesaduf E?

**Idrîs HENAN**

Her kes li benda roja 20 Çile bû. Dunya ji aliyê xwe ve çavên wan li koşka spî bû. Efrîniyên li koçberiyê jî çavên wan asoyên Efrînê dipan. 20 Çila jî hat û derbas bû. Trumpê kirêt jî çû. Lê hîna çeteyên Elnusra, bermahiyên DAIŞ, dûvik û xwefiroşên tirko li Efrînê ne. Hîna jî tiştek heye bala mirovan dikêşe; gelo çûyîna Trumpê kirêt û salvegera roja êrişên dagirkeriyê rasthatinek xwezayî yan çêkirinek bi qastî bû?

Dibe ku bala her kesî kişandibe? Dibe jî qet ti kesî mereq nekiribe? Lê li gorî dîroka hişmendiya desthilatdaran tiştekî bi navê tesaduf nîne. Ji bo her tiştî amadekariyek heye. Dibe jî ew roja koşka spî ne li gorî roja êrişên li ser Efrînê be, lê bê guman roja êrişên li ser Efrînê bi baldarî hatiye hilbijartin.

Çawa ku bêdengiya li hemberî êrişan ne ji rêzê bû, îro jî bêdengiya li hemberî itîfaqên nû yên li ser vîna gelan ne ji rêzê ye. Dêmekî lihevkirinek nû ya li gorî terazûya ku wê serdestên koşka spî yên nû ava bikin, wê hebe. Êdî ev dê bandorek çawa li ser vê rasthatinê bike, mewzûbehs e?.

Birêvebirên koşka spî, piştî serdestiya wan a kurt, di derheqê palpişta terora cîhanî Tirkiyê de raporek li ser zarê wezareta xazîneyê derxistin. Di raporê de tê gotin ku; çeteyên DAIŞ bi piştgiriya lojistîk a Tirkiyê ji nû ve xwe zindî dikin. Ango; çeteyên DAIŞ hîna jî pişta xwe bi Tirkiyê germ kirine ku palpişta wê ya hebûnê ye. Wê çaxê jî, di sala 2019'an de, dema ku hêzên koalisyona navneteweyî bi alîkariya istixbaratî ya hêzên QSD, zilamê Tirkiyê El Bexdadî li Idlibê kuştin, dan xuyakirin ku El Bexdadî li cihekî li nêzî bargeheke tirkan a leşkerî xwe veşartibû. Berpirsên amerîkî wê demê ji Tirkiyê xwestin ku vê rasthatinê rave bike. Lê guhek kerr û guhek ji kevir bû. Zilamê Amerîka yê wê demê Trumpê kirêt, tevî spasiya hêzên QSD, paşiya Erdogan a rût carek din veşart. Gelo ew jî tesaduf bû?

Ji aliyê xwe ve ragihandina Tirkiyê guhên mirovan kun kiriye. Qaşo rojane şaneyên DAIŞ digire. Lê heman ragihandin behsa girtina kesên ku têkîliya Tirkiyê û çeteyên DAIŞ ya beolojîk eşkere dikin nake. Di sala 2014'an de, dema ku kemyonên istixbarata Erdoxan û Heqan Fîdan hewl didan barê xwe bigihînên çeteyên DAIŞ û Elqayîde yên li Sûriyê, hatin girtin. Li gorî wê jî lêpirsîn hatin vekirin. Di encamê de, bi dîmen, foto û belgeyan îsbat bû ku hikûmeta APK-MHP piştevanê sereke ya terora cîhanî ye. Ya baş ew e, lêpirsîna wê demê ya tirkan bi xwe ne ya kesek din bû. Lê dîsa jî lêpirsîner, rojnamevan û ekîpa polîs, cendirme û qaziyan hemû wenda bûn. Bêdengiya navneteweyî ya wê demê jî tesaduf bû?.

Di 18 Çile de, wezîrê parastinê yê Tirkiyê serdana Bexda û Hewlêrê dike. Ji bo îmhakirina Tevgera Azadiyê hinek pêşniyaran li herdu hikûmetan dike. Yan em û we, yan hûn û hikûmeta Başûr, an ez ê bi tenê êriş bikim. Leqandina herdu seriyan, gefxwarinên Erdoxan û dûvleqandina rejîma Şamê li Şehba û Cizîrê jî tesaduf bû gelo?.

Her tişt li dora navenda hêzê dilebite. Zagona sermayeyê wisa dibêje. Ji lew re jî, tiştekî bi navê tesaduf û rasthatinan li wê navendê nîne. Tenê xwerêxistin xwe radigire û hemû planên ku qaşo tesaduf in, xira dike. Efrîn be, dixwaze Serê Kaniyê û Girê Spî be, ji xeta Cerablus û tevahî Sûriyê bigire navê, ancax bi vê şêwazê bêtin rizgarkirin. derveyî vê yekê, çûyîna li ber lingên rasthatinan e.